WHERE IS THE SUPPORT SYSTEM AFTER SEXUAL VIOLENCE?

# ZANYARIYÊN HIQÛQÎ YÊN DERBARÊ TUNDKARIYA ZAYENDÎ YA ONLINE DE

Association for Struggle against Sexual Violence

Association for Struggle against Sexual Violence

[cinselsiddetlemucadele.org/en](https://cinselsiddetlemucadele.org/en)

[csdestek.org/ku](https://csdestek.org/ku)

**Naverok**

İrem Yener, Parêzer

**Kesên alîkarî dane**

Arzu Aydoğan, Parêzer

Begüm Baki

Eda Dilara Toca, Parêzer

İrem Özgürcan

Tuğba Yavuz

**Sêwirandin**



WHERE IS THE SUPPORT SYSTEM AFTER SEXUAL VIOLENCE?

Di vê belavokê de çendîn zanyariyên derbarê tundrakiya zayendî de hene; dibe ku ev zanyarî tiştên derbarê tundkariyê de bînin bîra te yan jî bandorên curbecûr li te bikin. Ger te ev tişt ferq kirin, bêhna xwe hêdî hêdî bide û bistîne û dest ji xwendinê berde. Kengî te got 'ez amade me', tu dikarî careke din dest bi xwendinê bikî.

# Naverok


1. Destpêk: Tundkariya Online û rola Amûrên Dijîtal 6

2. Tundkariya Zayendî 8

3. Tundkariya Zayendî ya Online 9

4. Cûreyên Sûcan ên Derbarê Tundkariya Zayendî ya Online de 11

5. Mekanîzmayên Serlêdanê 21

6. Encam û Çavkaniyên Piştgirîdayînê 24

# 1- Destpêk: Tundkariya Online û rola Amûrên Dijîtal

Teknolojî û amûrên ragihandinê yên dijîtal û yên medyaya civakî, bi lez û bez bipêş dikevin. Vê rewşê bergeh, wesf û sixleta tundkariya dijîtal berfireh kiriye; ji ber ku bikarhêner dikarin li ser platformên medyaya civakî nasnameyên xwe veşêrin, tiştên tên parvekirin dikarin di nava gelek kesan belav bibin û di vê pêvajoyê de şopandina rêyên parvekirina van tiştan zehmet e, bandorên neyênî yên liv û tevgerên dijhiqûqî yên li ser mexdûran zêdetir û kûrtir bûne. Di encama vî tiştî de ev cûre liv û tevgerên di qada dijîtal de pêk tên, ji bo kesên li dijî wan pêk tên tên wateya cûreyekî nû yê tundkariyê û bi vî rengî jî ketiye nava lîteraturê.

Di tundkariya dijîtal/online de amûrên teknolojiyê û/yan jî medyaya civakî ji bo bandorê li hinekan bikin an jî wan bixin bin kontrola xwe tên bi kar anîn û bi van liv û tevgeran dixwazin zerarên derûnî, civakî û aborî bidin kesên tundkarî li wan tên kirin. Navê van cûre liv û tevgeran tundkariya dijîtal/online e. Ji bo penasekirina van cûre liv û tevgeran hîna lihevhatinek nîne. Lê em dikarin navê tundkariya dijîtal, tundkariya online, tundkariye sîber û yên mîna wan lê bikin. Lê liv û tevger û encamên hemûyan jî heman tişt in. Di vê belavokê de em ê ne tenê behsa tundkariya bi rêyên amûrên dijîtal pêk tên bikin, her weha em ê behsa tundkariya bi taybet li qad û sepanên înterneta online pêk tên jî bikin. Her weha em ê behsa pêngavên hiqûqî jî bikin ku divê di vî warî de bên avêtin. Ji ber wê jî, em ê peyva tundkariya online bikar bînin.

Car caran tiştên dijîtal û yên li ser medyaya civakî hatine parvekirin, bi temamî nikarin bên rakirin, bên jêbirin an jî ne mimkun e dataya hatiye parvekirin bênşopandin. Ji ber vê rewşê jî bandorên tundkariya online, dikare demeke berfirehtir berdevam bikin. Ev jî bi xwe re wê ihtimalê derdixe holê ku kesê/a tundkarî lê bûye û sax maye, dikare ew tundkarî dubare car lê bibe. Lê weke di pêvajoyên hemû tundkariyan de, di vê pêvajoyê de jî tundkarî sûcê wî kesî ye ku pêk aniye û li beramberî vê tundkariyê, pêkanînên hiqûqî hene. Yek ji gavên herî girîng di vê pêvajoyê de xwestina piştgiriya hiqûqî ye.

Tirsandin, enirandin, lêsorkirin, tacîz, buxtan, bêbextî, îfşakirin û vederkirin cûreyên tundkariya online in. Dibe ku tundkariya dijîtal bi yek ji van liv û tevgeran pêk bê, lê dibe yek du û zêdetirên wan bi hev re pêk bên û bi cûreyên din ên tundkariyê re têkel bibin û pêk bên. Mînak, dema kesek fotografekî taybet ê têkildarî mijareke cinsî bêdestûr biweşîne, ev him dibe tundkariya online, hem jî ya zayendî.

Komeleya me raporek bi navê "Rapora Nirxandina Bandorlêkirinê ya 2022yan a Xebatên Piştgiriyê yên Piştî Tundkariya Zayendî" amade kiribû. Li gorî vê raporê, kesên ji bo şêwrê telefonî me kirine, bêhtirê wan tundkariya zayendî ya online li wan bûye. Ji ber ku her diçe rêjeya vê zêdetir dibe û di qanûnan de rasterast behsa tundkariya zayendî ya online nayê kirin, me xwe neçar dît ku em vê belavokê amade bikin.

## 2- Tundkariya Zayendî

Her cûre çalakî, liv û tevger û destwerdanên ku li dijî tevahiya laş û/an jî zayenda kesan pêk tên , tundkariya zayendî ne. Di vî cûreyê tundkariyê de destûr[1] nîne. An jî car caran kes, bi rê û rêbazên cuda pêvajoya destûrdayinê saz dikin. Car caran jî ger nikaribin destûrê werbigirin bi gef û hewldanên zayendî yên nayên xwestin, vî tiştî dikin. Liv û tevgerên ku li dijî zayend, meyla zayendî, nasnameya zayendî ya civakî pêk tên yan jî gotinên ku zayenda civakî dikin hedef, destwerdanên gefê li tenduristiya civakî dixwin, astengkirina bidestxistina derman û xizmetguzariya tenduristiya zayîniyê an jî ameliyatkirinên mecbûrî yên ji bo nasnameya zayendî hatine kirin jî dikevin nava penasekirina zayenda civakî. Dikare bi çavtirsandin, gefxwarin û cûreyên din ên gefxwarinê pêk bê. Di encamê de tundkariya zayendî dibe ku çalakiyeke bi encambûyê be yan jî hewldana wê tê kirin an jî tenê hîna pêk nehatibe. Hemû pêvajo dikarin di bin navê tundkariya zayendî de verin penasekirin.

[1] Ji bo zanyariyên zêdetir: Cinsel Şiddetle Mücadele Derneği, tabukamu, Cinsel Davranışlarda Onay ve Onay İnşası https://www.tabukamu.com/cinsel-davranislarda-onay

## 3- Tundkariya Zayendî ya Online

Tundkariya zayendî ya online bi amûrên ragihandinê yên dijîtal pêk tên. Di vî cûreyê tundkariyê de mirov hedef in. Her weha bêyî daxwaza mirovan pêk tên.  Liv û tevgerên zayendî ne, êrîşkar in, mirovan biçûk dixin an jî dixwazin çavên wan bitirsînin.

Em dikarin ji bo vê mijarê van tiştan mînak bidin: Bi darê zorê fotograf an jî vîdeoyên cinsî bidin kişandin. Her çend herdu alî ji hev razî bin û peyamên cinsî ji hev re şandibin jî, lê bêyî destûra aliyekî, wan peyaman, ji hinekên din re bişînin û/an jî gefa şandinê bixwin. Her çend a/ê li hember nexwaze jî bi rêya amûrên dijîtal û bi darê zorê naverokên cinsî pê bide temaşekirin, guhdarkirin, xwendin, nivîsandin. Bêyî daxwaza ya/yê li hember, bi amûrên medyaya civakî li dijî nasnameya zayendî, meyl û pratîkên zayendî yên kesekê/î din de hin tiştan bike...

Platformên medyaya civakî rê li ber wan tiştan vedike ku mirov bi hêsanî bikaribin xwe veşêrin û bi hesabên sexte xwe cuda nîşan bidin. Ji ber vê rewşê jî, mirov bi hêsanî dikarin liv û tevgerên tundkariya zayendî ya online bikin û ev jî dibe sedem ku nasnameya wan mirovan neyê dîtin û ew neyên cezakirin.

Di Qanûna Cezayan a Tirkan de ji bo vî cûre tundkariyê rasterast tiştek nîne. Ji ber wê jî mekanîzmayeke gilîkirinê û dadgehkirinê jî nîne. Weke tê zanîn di sala 2021yan de Tirkiye bi Biryarnameyeke Serokomariyê, Peymana Stenbolê betal kiribû. Welatên Peymana Stenbolê îmze kiribûn, berpirsiyar bûn ku her cûre sûcî di qanûnên xwe yên netewî de penase bikin û tedbîran ji bo bergiriya sûcan werbigrin. Lewre yek ji cûreyên sûcan ên di Peymanê de hatibûn penasekirin, tundkariya online bû. Lê piştî ku Peymana Stenbolê

hate îmzekirin, li Tirkiyeyê tundkariya online di qanûnan de bi rengekî aşkere nehate penasekirin. Her weha dema qanûn hatin guhertin jî ev nehate kirin û guhertin ji bo bergiriyê nehatin kirin.

Dîsa jî di pêvajoya lêpirsîn û pêyketinê de ji bo mirov bikaribin giliyê van tiştan bikin, gelek xal hene:

Azar ango tahdedayîn (TCK xala 96an)

Tacîza zayendî (TCK xala 105an)

Gefxwarin (TCK xala 106an)

Şantaj (TCK xala 107an)

Têkbirina aramî û xweşiya mirovan (TCK xala 123an)

Şopandina bi israr (TCK xala 123/A)

Heqaret (TCK xala 125an)

Sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê agahdarbûnê (TCK xala 132yan)

Sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet (TCK xala 134an)

Tomarkirina zanyariyên şexsî (TCK xala 135an)

Dan an jî bidestxistina daneyan a deryasayî (TCK xala 136an)

Sûcê ketina sîstema înformasyonê (TCK xala 243yan)

Bi teknolojiya DeepFake-ê çêkirin û parvekirina dîmenên sexte yên cinsî.

## 4- Cûreyên sûcan ên derbarê Tundkariya Zayendî ya Online de

### Azar ango tahdedayîn (TCK xala 96an)

Kesên ku tahdeyê bidin hin kesên din, li gorî vê vê xalê tên dadgehkirin û cezakirin. Di sala 2022yan de Qanûna Cezayan a Tirkan (TCK) hate guhertin. Bi vê guhertinê re kesên ku li dijî jinan sûcekî bikin, dema ceza li wan bê birîn, êdî wê sînorekî jêr ê cezayî hebe û li gorî vê rewşê ceza li wan bê birîn.

Di vî cûreyê sûcî de kiryarên tundkariyê bi rengekî zelal nehatine penasekirin. Lê di hinceta qanûnê de hatiye gotin ku dema çalakiyên ne li gorî rûmeta mirovan bên kirin; dema hin kes ji hêla laşî û giyanî êşê bikişînin, biçûk bênxistin, ev azar ango tahde ye. Ji hêla hîqûqî lê dinêrin bê ka gelo rûmeta mirovan, hevgirtina laşê wan ya madî û manewî têk çûye yan na. Ger yek ji van pêk hatibe, wê gavê sûcê azar ango tahdedayînê pêk hatiye. Lewre ev cûre kiryar dibe di heman demê de heqaret, gefxwarin û tacîza zayendî bin. Dema em li kiryarên tundkariya zayendî ya online dinêrin, em dibînin ku tundkarî dibe sedem ku mirov êşê bikişînin, êrîş li rûmet, hevgirtina wan a madî û manewî pêk tê, bandora wê demeke dirêj berdevam dike û car caran heta hetayê berdewam dike. Ji ber wê ye ku dema mirov giliyê yek ji van kiryaran bike, dikare bibêje sûcê azardayînê jî pêk hatiye.

### Tacîza zayendî (TCK xala 105an)

Ger kesek bi armanceke zayendî hin kesan tacîz bike, li gorî vê xalê ceza lê tê birîn. Ev cûre tacîz, dibe ku fîzîkî jî pêk bê an jî bi amûrên online û yên medyaya civakî jî. Ji ber wê ye jî, dema ev cûre tundkarî bi rêya poste yan jî amûrên ragihandinê yên elektronîk pêk werin, li gorî qanûnê, dadgeh dikare rêjeya cezayî zêdetir bike.

Ger dema kesek bi rêya amûrên medyaya civakî yan jî amûrên dijîtal bêyî daxwaza hinekên din gotinên û xwestekên zayendî ji wan re bişîne, laşê xwe yê tazî nîşanî wan bide, dengên behsa naverokên cinsî dike bişîne, fotografên ku organên zayendî tê de xuya dikin bişîne, liv û tevgerên di dema hevdîtinên bi rêya vîdeoyan an jî bi deng pêk tên, ev weke sûcên tacîza zayendî tên qebûlkirin.

## Gefxwarin (TCK xala 106an)

Ger kesek gefê li hin kesan bixwin û ji wan re bibêjin, ew ê êrîşî wê/î yan jî xizmên wê/î bikin an jî bêgunehiya laş an jî zayendîtiya wê/wî kesê/î ji holê rakin, divê ev li gorî vê xalê were cezakirin. Piştî ku di sala 2022yan de TCK hate guhertin, ji bo vî cûreyê sûcî jî hate diyarkirin ku ger sûc li dijî jinan pêk bê, sînorekî jêr ê cezayî heye û fail li gorî vê rewşê wê bê cezakirin.

Ger gefê li hin kesan bixwin û dîmenên wan ên tazî bikişînin an jî bi rêyekê werbigirin, van dîmenan li ser înternetê, li ser torên medyaya civakî yan jî bi rêyên taybet ên peyamşandinê bi hin kesên din re parve bikin, ev weke sûcên tundkariya zayendî yên online tên qebûlkirin.

## Şantaj (TCK xala 107an)

Dişibe sûcên gefxwarinê lê encamên wê û bandorên wê xurttir in. Dema em ji hêla tundkariya zayendî ya online li mijara şantajê binêrin, ger kesek gefê li hin kesan bixwin û bibêjin ew ê tiştên zirarê bidin rûmet û xesleta wan aşkere bikin an jî bi van tiştan wan ew tohmet bikin, ev dibe sûcê şantajê. Divê bi wî rengî pêk bê ku kesên wî karî dikin, fêdeyekê ji wan kesên şantajê li wan dikin werbigrin û bandorê li ser îradeya wan bikin.

Mînak, ger kesek ji kesekê/î re bibêje ew ê fotograf an jî vîdeoyên wê/î yên taybet biweşînin an jî li ser medyaya civakî parve bikin û pereyan ji wê/î bixwaze, dema aliyek bixwaze têkiliya xwe bi kesekî/ê re biqedîne û yê li hember bibêje ger tu têkiliyê berdevam neke, ez ê dîmenên te yên taybet

biweşînim an jî bi vê rêyê neçar bike û pê re têkiliya zayendî deyne, ev tên wê wateyê ku ew sûcê tundkariya zayendî ya online, bi rêya şantajê pêk hatiye. Her weha kesek ji kesekê re bibêje "Ger tu neyê hevdîtina min, ez ê ji malbata te re bibêjim tu lezbîyenî, ger tu dev ji min berdî, ez ê nehêlim tu careke din zarokên xwe bibînî, ez ê ji zarokên te re bibêjim tu karkera seksê yî..." ev jî tê wê wateyê ku sûcê şantajê pêk hatiye.

Sê qonax hene di pêvajoya pêkhatina sûcên şantajê de ku di encama bikaranîna dîmenên zayendî de çêdibin.[2] Ev ew in:

1- Ger dîmenên zayendî bi daxwaza yê/ya li hember hatibe bidestxistin an jî bê daxwaza yê/ya li hember...

2- Ger yê/ya ew dîmen bidest xistibe, ji yê/ya li hemberî xwe bixwaze tiştekî bike û ew jî neke û yê/ya dîmen di dest de ye gefê lê bixwe û bibêje ew ê dîmenan ji hin kesên din re bişîne (şantaj) û

3- Ger yê/ya li hember tiştên ku tên xwestin neke û ew ê/a dîmen di dest de ye dîmenan ji hin kesên din re bişîne.

Divê neyê jibîrkirin ku berpirsiyariyên van her sê qonaxan ji hev cuda ne. Yanî ger yek dîmenan bi dest bixe û şantajê bike yan jî dema tiştê ku dixwaze pêk neyê û paşê dîmenan belav bike, ev her sê tişt, li gorî xala qanûnê, divê ji hev cuda werin nirxandin. Di vê rewşê de divê fail ji bo her sê qonaxan cuda cuda were cezakirin.

## Têkbirina aramî û xweşiya mirovan (TCK xala 123an)

Dema kesek bi armanca têkbirina aramî û xweşiya hin kesan liv û tevgerên li dijî hiqûqê bikin, divê li gorî vê xalê werin cezakirin. Bi van liv û tevgeran destwerdanê di jiyana taybet û ya civakî ya kesên din de dikin û nahêlin ew bi awayekî azad bijîn û aramiya nava mirovan, azadiya biryardayîn û liv û tevgerînê ya kesan ji dest wan dibin. Piraniya caran ev liv û tevger, di nava hin sûcên din de nayên dîtin û lêpirsîn an jî pêyketina wan nayên kirin.

[2] Mehmet Emre Yıldız, Yargıtay Kararları Işığında Dijital Flört Şiddeti Teşkil Eden Yöntemlerden Doğan Ceza Sorumluluğu, https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/2606124

Mînak, dema kesek bi israr telefonî kesekê/î bike an jî mesajan jê re bişîne û tacîza zayendî lê bike, ev dibe sûcê tacîza zayendî. Ew îdiaya ku dibêje aramî û xweşî têk çûye, li derveyî van sûcdariyan dimîne. Her weha ji bo tiştek weke sûc bê qebûlkirin, divê heta demekê berdewam bike. Lê tiştekî zelal nîne ku bê ka ev dem divê çiqas be. Li gorî wê rewşa heyî tê nirxandin.

Dema kesek bi armanceke zayendî telefonî hin kesan bike yan jî peyaman jê re bişîne, bi darê zorê bixwaze ku ew li ser hev peyaman bişîne, cihnîşana xwe diyar bike yan jî fotografan bişîne, her çend ya/yê li hember bibêje ew naxwaze têkiliyê deyne lê ji bo têkiliyê israr bike, ev dibin sedema pêkhatina vî sûcî.

## Şopandina bi israr (TCK xala 123/A)

Ev cûre sûc, di sala 2022yan de ketiye nava Qanûna Cezayan a Tirkan. Rewşeke taybet a têkbirina aramî û xweşiya mirovan e. Weke serkeftineke Peymana Stenbolê ye ku destpêkê di Qanûna Derbarê Bergiriya Tundkariya li Jinan û Parastina Malbatan a Hejmar 6284an de hatibû bicihkirin. Paşê jî ketibû nava TCKyê.

Li gorî vê xala Qanûnê, "Dema kesek bi israr bide pey hinekan û wan bişopîne yan jî bi amûrên ragihandinê û agahdarkirinê, sîstemên înformatîk an jî bi rêya kesên din bixwaze peywendiyê çêbike û di encamê de jî aramiya kesên din têk bibe yan jî wê/wî yan jî xizmên wê/wî bixe nava xetereyê" wê gavê ev dibin sûcên şopandina bi israr.

Ger ev tişt li dijî zarokan, hevjînên biryara veqetandinê ji bo wan hatiye dayîn yan jî yên veqetiyane pêk bê, ger di encama van tiştan de kesên li hember neçar bimînin dibistanên xwe, kargeh an jî xaniyê xwe biguherînin, dest ji dibistan an jî karên xwe berdin, wê gavê, ceza zêdetir dibe.

Ne girîng e ku dema ev sûc hate kirin ew sûc li gorî armancekê hatibe kirin. Yan jî li armanca wê nayê nêrîn. Bes e ku kesa/ê ev tişt li hemberî wê/wî pêk hatiye bi rengekî cidî nerihet bibe yan jî ji bo xwe yan jî xizmên xwe bikeve nava metirsiyê. Di encamê de, ger tiştên tên kirin dubare bibin û bi israr pêk bên, tê wê wateyê ku ev sûc pêk hatiye.

Mînak, yek bi israr telefonî yekê/î bike yan jî bi rêyên amûrên cuda yên înformasyonê wan nerihet bike, gelek caran bi van amûran tacîza zayendî pêk bîne, ev tê wê wateyê ku sûcê şopandina bi israr, bi rengê tundkariya zayendî ya online pêk hatiye.

## Heqaret (TCK xala 125an)

Ger kesek bi liv û tevger an jî tiştekî, tohmetê li hinekan bike û bi vê jî ziyanê bide rûmet, şeref û rêzdariya wan, yan jî dijûnan ji wan re bide û êrîşî rûmet, şeref û rêzdariya wan bike, wê gavê li gorî vê xalê, ceza divê bê dayîn. Ger ev tişt bi rêya amûrên online ango bi amûrên dengî, nivîskî yan jî dîtbarî pêk bên, dîsa bi heman rengî divê were cezakirin.

Di demên dawiyê de ji ber ku amûrên online bingehan ji wan re çêdikin, rêjaya sûcên bi van amûran tên kirin zêde bûye. Bi taybet jî tundkarî li jinan û LGBTI+yan tê kirin û nasnameyên wan ên zayendî dibin hedef. Dema kesek, li ser medyaya civakî êrîşî meyla zayendî, nasnameya zayendî yan jî pratîkên zayendî yên hinekan bike, ji bo biçûk bixe bibêje dê***, qe****, d*qe**, wê gavê sûcê heqaretê bi rengê online kiriye û ev jî tundkariya zayendî ya online e.

## Sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê agahdarbûnê (TCK xala 132yan)

Ger kesek xala mafê nepenîtiyê yê agahdarbûna di navbera kesan de binpê bike yan jî peyam û tiştên din ên ku du kes ji hev re dişînin bi rengekî dijyasayî aşkere bike, ew kes li gorî vê xalê divê bê cezakirin. Dema kesek naverokên peyam û yên mîna wan tomar bikin, wê gavê ev ceza divê bê zêdekirin.

Mînak, dema du kes di navbera xwe de li ser tiştên cinsî diaxivin, ji hev re fotografên cinsî dişînin an jî telefonî hev dikin û behsa tiştîn cinsî dikin û yek ji wan van tiştan tomar bike, dema bêyî destûra aliyê din van tiştan aşkere bike yan jî biweşîne, ev tê wê wateyê ku sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê ya agahdarbûnê bi rengê tundkariya zayendî ya online pêk aniye.

## Sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet (TCK xala 134an)

Li gorî Qanûna Cezayan a Tirkan, dema kesek mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet ê hin kesan binpê bike, divê ew bi cezayê girtîgehê bê cezakirin. Dema deng an jî dîmenan tomar bike yan jî van bi rêyên dijyasayî aşkere bike, cezayê vî tiştî divê bê zêdekirin. Dema kesek amûrên deng an jî dîmenan tomar dikin li mala hin kesan bicih bikin û van daneyên ku kom kirine parve bikin, peyam, fotograf û dengên bi taybet ji bo kesekî/ê hatibin şandin aşkere bikin, yan jî bi parvekirina wan, gefê li kesekê/î bixwe, jimara telefonê ya hin kesan bêyî destûra wan li ser platformên medyaya civakî parve bike, ev û yên mîna wan dibin sedema binpêkirina mafê nepenîtiyê yên jiyana taybet.

Rê û rêbazên bidestxistina dîmenan, li gorî Qanûna Cezayan a Tirkan, li gel binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyan a taybet, ew kes dikare bi hin cûreyên din ên sûcan jî weren tohmet û cezakirin. Dibe ku fail ew dîmenên cinsî bi rê û rêbazên cuda bi dest xistibe, yan jî bi rengekî wan li cem xwe dihêle. Dibe ku bi destûra mexdûrê/î ew dîmen hatibin tomarkirin an jî mexdûrê/î bi xwe ew dîmen şandibin yan jî mexdûr hatibe xapandin û hatibin bidestxistin, bi rengekî veşartî û bêyî destûr hatibe wergirtin, hatibin tomarkirin an jî bi rêyên dijyasayî midaxele li sîstemên înformasyonê yên mexdûrê/î hatibin kirin û hatibin bidestxistin ango bi rêyên sûcên înformasyonê hatibin bidestxistin.

Dema kesek destûrê bide ku naverokên cinsî werin tomarkirin, ew kes bi tenê dikare wan çêbike û li cem xwe wan hilgire lê ew nayê wê wateyê ku wan bi hin kesên din re pave bike. Ger wisa bike, ew tê wê wateyê ku ew karekî dijhiqûqî ye. Ji ber wê ye ku ger kesek bi daxwaza kesê/a li hember, dîmenên cinsî werbigire yan jî wan peyda bike, lê van dîmenan bi hin kesên din re parve bike, wê gavê sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet pêk tê.

**Jiyana taybet**; ne tenê jiyana kesekî/ê ya dûrî çavan e û bi kesên din re parve nake, ya li pişt deriyên girtî û di nav çar dîwaran de û ya veşarî ye jî. Her

weha hemû bûyer û agahiyên şexsî yên taybet ku her kes nizane yan jî divê nizanibe, yên ku dema were xwestin dikarin ji kesên din re werin vegotin, ew jî tiştên jiyana taybet in. Ji ber vê yekê, yek di nava civakê de be jî ev nayê wê wateyê ku her dîmen an dengê wî/wê yên li vê qadê, dikarin werin guhdarkirin, temaşekirin, tomarkirin û bê destûr werin parastin.

Ger kesek li qadên civakî jî be, ew xala ku dibêje "di nava qelebalixê de jî mirov dikarin balê nekişînin, neyên naskirin û neyên zanîn" derbasdar e. Tiştên ku mirov di nava rojê de dikin, cihên ku diçinê, hevdîtinên bi kesên din re dikin, li ku û kengî hevdîtinan dikin, ev hemû jî parçeyên jiyana taybet in. Her wiha, agahiyên ku bi rêya çavdêrî û kontrola berdewam hatine bidestxistin û çalakiyên ku ew kes naxwaze ji aliyê kesên din ve werin dîtin û zanîn jî, dikevin qada jiyana taybet. Ji ber wê ye ku li qadên civakî jî bin, hin kes bêdestûr wêneyên kesan bigirin û wan ji bo armancên cinsî bikar bînin û wan belav bikin, ev jî mînaka sûcê tundkariya zayendî ya online e û ev kiryar tawana binpêkirina nepenîtiya jiyana taybet pêk tînin.

Dema rayedar/erkdarekî dewletê, erka xwe ji bo tiştên nebaş bikar bîne û vî sûcî bike yan jî kesek sûd û fêdeyên ji ber pîşe yan jî xisleteke hunerî bidest xistiye bi kar bîne û vî sûcî bike, divê cezayê wî bi qasî nîvî were zêdekirin.

## Tomarkirina zanyariyên şexsî (TCK xala 135an)

Dema kesek bi rêyên dijyasayî zanyariyên şexsî yên kesên din tomar bike, ev cûre sûc pêk tê. Her weha dema ev zanyariyên şexsî yên ne bi rêyên dijyasayî hatine tomarkirin, derbarê fikr û ramanên siyasî, felsefî yan jî olî yên kesan de bin, derbarê nîjad; meylên exlaqî, jiyana cinsî, rewşa wan a tenduristiyê yan jî peywendiyên wan ên bi sendîkayan re be, li gorî paragrafa yekê ya vê xalê, ev ceza divê were zêdekirin.

Îro roja me, gelek saziyên dewletê û yên taybet, zanyariyên şexsî tomar dikin û wan bikar tînin. Dema kesên ku destûra wan a gihîştina van zanyariyan hene, li derveyî erka xwe van zanyariyan tomar bikin û wan bikar bînin, ev jî dikeve nava sînorên vî sûcî.

Ji bo ev cûre sûc pêk bê, divê ew dane, zanyariyên derbarê şexsan de bin. Dîmenên tazî yên mirovan jî zanyariyên şexsî ne û dema tiştekî bi vî rengî pêk bê, wê gavê sûcê tomarkirina zanyariyên şexsî pêk tê lê di heman demê de mafê nepenîtiya jiyana taybet jî tê binpêkirin û divê her du sûc bi hev re werin nirxandin.

Lê gava nasnameya zayendî, meyla cinsî yan jî statuya derbarê HIVê de werin tomarkirin, wê gavê tê wê wateyê ku zanyariyên şexsî, ne li gorî hiqûqê hatine tomarkirin û ev sûc pêk hatiye.

## Dan an jî bidestxistina daneyan a deryasayî (TCK xala 136an)

Ger kesek zanyariyên hin kesên din, dijyasayî bidest bixe, bide hinekên din an jî wan belav bike, wê gavê ev cûre sûc pêk tê û kesê/a ku ev sûc kiriye, divê were cezakirin. Ger kesek li ser navê hin kesên din hesabên medyaya civakî veke û li ser navê wan hin tiştan biweşîne, wê gavê tê wateya ku ev sûc pêk hatiye.

Gelek caran dema li ser navê hin kesên din hesabên medyaya civakî tên vekirin û ew kes dijyasayî tên hedefgirtin an jî tundkariya online li dijî wan pêk tê, bêhtir bi vî rengî ew cûre sûc tê kirin. Mînak, dema kesek li ser navê kesekî/ê hesabê sexte veke û jimara wî/ê ya telefonê yan jî fotografên wî/ê yên taybet biweşîne, bi rêya vî hesabî, tiştên sexte û cinsî yên taybet binivîsîne û parve bike û bi vê re bandorê li jiyana taybet a wî/wê kesî/ê bike... Dadgeha Bilind di demên berê de biryarek dabû û gotibû, ji ber li ser navê kesekî/e din hesabekî sext yê medya civakî hatiye vekirin û li ser vî hesabî naverokên cinsî hatine weşandin, him sûcê bidestxistina zanyariyên şexsî yên dijhiqûqî him jî sûcê heqaretê hatiye kirin.[3]

## Sûcê ketina sîstema înformasyonê (TCK xala 243yan)

Ger kesek bi rêyên dijyasayî bikeve nava tevahiya sîstemeke înformasyonê yan jî beşeke wê, di nava wê de bimîne yan jî şandin û wergirtina daneyên nava vê sîstemî yan jî hin sîstemên din bişopîne, li gorî vê xalê divê were

[3] Ji bo zanyariyên zêdetir: https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/2606124

cezakirin. Ger dema vî karî dike, bibe sedema windabûna daneyan, wê gavê cezayê divê lê bê birên, bê zêdekirin.

Ev cûre sûc yek ji cûreyên tundkariya online e. Dema kesek bi rengekî dijyasayî û bi nivîsbariyên diyar/casûs bikar bîne û bikeve amûrên mîna komputeran an jî sîstemên înformasyonê, wê gavê ev cûre sûc pêk tê. Ger dema bikeve van sîsteman û zanyariyên şexsî bidest bixe û wan bi rengekî dijyasayî biweşîne, wê gavê hin sûcên din jî tevî vî sûcî pêk tên. Dibe ku ev zanyarî berê di sîstem/kompûteran de bin an jî piştî bi rêyên dijyasayî bikevin sîstem/komputeran û van zanyariyan li wan bar bikin.

Mînak, dema hinek hesabên medyaya civakî yan jî e-maîlên hin kesan bi dest bixin û bi rêya van hesaban peyam an jî dîmenên cinsî aşkere bikin, wê gavê him sûcê ketina sîstema înformasyonê pêk tê, him jî mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet tê binpêkirin.

## Bi teknolojiya DeepFake-ê çêkirin û parvekirina dîmenên sexte yên cinsî

Dema mirov bi alîkariya teknolojiya hişê çêkirî yan jî teknîkên makîneyan, vîdeo yan jî dengên sexte yan jî yên manîpulekirî çêbikin, ji vê re dibêjin teknolojiya DeepFake. Bi vê teknolojiyê re deng an jî dîmenên hin kesan, di rewş û atmosferên cuda de bikar tînin û vê jî bi rengekî gelekî rastîn çêdikin. Di demên dawiyê de bi vê teknolojiyê rûyê hin kesan digrin û li şûna rûyên hin kesên din bicih dikin û bi vê re jî bêyî destûra kesên rûyên wan hatine bikar anîn, naverokên pornografîk/cinsî çêdikin. Her roja ku diçe teknolojî bi pêş dikeve û bi vê re him tiştên me li jor behsa wan kirî, yên dijyasayî belavtir dibin him jî hin vîdeo û tiştên din tên çêkirin ku her diçe piştrastkirina wan zahmet dibe.

Di Hiqûqa Tirkiyeyê de ev mijar weke sûc nehatiye pejirandin û her roja diçe girîngtir dibe ku bê wê çawa were cezakirin. Çêkirina deng û dîmenên bi vî rengî û belavkirina wan a li ser înternetê, bi şêweyên cuda yên hiqûqî tên nirxandin.

Mînak, divê pirs lê bê kirin ku gelo bê ka ew dîmen/fotografên di vîdeoyên bi teknolojiya DeepFake hatine amadekirin, çawa hatine bidestxistin. Ger ev fotograf bêyî destûr û bi rengekî dijsayayî hatibin bidestxistin, wê gavê dê li gorî sûcê binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet bê nirxandin. Lê ger ew fotograf bi destûr hatibin weşandin lê paşê ji bo vê teknolojiyê hatibin bikaranîn, wê gavê dê li gorî sûcê dayîna zanyariyên şexsî ya dijyasayî yan jî sûcê bidestxistinê bê nirxandin. Dema fotograf û dengê kesekê/î "di naverokeke cinsî de hatibe bikaranîn" wê gavê ji ber êrîş li ser rûmet û xisleta mirovî/ê jî hatiye kirin, divê li gorî sûcê heqaretê jî bê nirxandin.

Lê ji ber di Qanûna Cezayan a Tirkan de û yên din de ji bo van cûre sûcan tiştek nîne, divê neyê jibîrkirin ku dema bûyereke bi vî rengî pêk hat, li gorî rewa heyî bê nirxandin.

## 5- Mekanîzmayên ku dikarin serî lê bidin

Kesek dema tundkariya zayendî ya online lê bibe, ji ber wê rewşa tê de yî, dibe nexwaze gilî bike, bitirse gilî bike yan jî bibêje dibe bi min bawer nebin. Ev tiştekî xwezayî ye. Dibe ku ew kes ji ber vê rewşê bibêje qey ew tenê ye û xwe sûcdar bike. Bi piranî jî armanca faîlan ew e ku metirsiyê çêbikin û bihêlin mexdûr ji hêla civakî ve werin îzolekirin û tenêhiştin û bi vê re jî bandorê li wan bikin. Lê divê neyê jibîrkirin ku tundkarî, her demê sûcê faîlî bi xwe ye. Ger em nikaribin bikevin nava liv û tevgerê jî divê em ji bîr nekin ku mekanîzmayên em dikarin serî li wan bidin û piştgiriyê ji wan bjixwazin hene. Divê em ji bîr nekin ku em dikarin mekanîzmayên hiqûqî bikar bînin û di vê pêvajoyê de em ne bi tenê ne.

Ger te biryar da ku tu gilî bikî, wê gavê tu dikarî biçî navenda polîsan an jî ya cendermeyan a herî nêzîk an li edliyeyan jî Navendên Tundkariya li Jinan Dibe û ji wan bixwazî ku li gorî Qanûna Derbarê Bergiriya Tundkariya li Jinan Dibe û Parastina Malbatan a Hejmara 6284ê, biryara dûrxistin an jî biryara bergiriyê ya parastinê bidin.

**Biryara bergiriyê**, jin, zarok û endamên malbatan ên tundkarî li wan bûye û mexdûrên ku ji derveyî daxwaza wan hinek wan dişopînin ji bo bên parastin, dadwer, polîs an jî cenderme û rêvebirên xwecîhî li ser daxwazê yan jî bi serê xwe dikarin biryara bergiriyê ya parastina van kesan bidin. **Biryara dûrxistinê** jî yek ji wan tedbîran e ku li gorî Qanûna Hejmara 6284ê kesek pêwîst bibîne dikare daxwaz bike. Li derveyî van tiştan, li gorî heman qanûnê, keseke tundkarî lê bûye yan jî di nava xetereyê de be, mafê wê yê starbûnê, parastina demkî (ya nêzîk), guhertina nasnameyê, navnîşan û zanyariyên şexsî heye. Her weha kesê tundkarî kiriye, divê çeka xwe radestî polîsan bike, biryara welayeta demkî, nefeqaya bergiriyê, alîkariya darayî ya demkî, şerha ketina xaniyê malbatê, sîgorteya tenduristiyê ya giştî û hin xalên din ên li gorî vê qanûnê, dikarin werin kirin. Ji bo zanyariyên zêdetir tu dikarî li Qanûna Hejmara 6284ê û belavoka ku me derbarê vê mijarê de amade kiriye, binêrî.

Dema kesekê biryar da ku wê gilî bike, dikare biçe qereqola herî nêz û îfadeya xwe bide polîs an jî cendermeyan an jî biçe edliyeyê û îfadeya xwe bide dozgerê/a nobedar û gilî bike. Di vê pêvajoyê de girîng e ku gilîkar bikaribe îdiayên xwe ispat bike û bi wan tiştan, faîl were cezakirin. Her çend pêvajoya ispatkirina delîlan li gorî her sûcî û failî diguhere jî lê her cûre tomarên deng, dîmenên şaşeyê yên peyaman, vîdeo, fotograf, belge û dokumanên mîna wan, yên tundkariyê ispat dikin û şahidên ku şahidî li tundkariyê kirine, dikarin weke delîl bên nîşandan.

Her çend deng an jî dîmen dema bi rê û rêbazên dijyasayî hatibin tomarkirin weke delîl nayên pejirandin, lê di hin rewşan de dema ti delîl nebin, ji bo sûc were ispatkirin, dibe ev delîl ji hêla hiqûqê werin pejirandin. Ji ber wê ye hemû delîlên ku hene, yên dikarin sûc an jî bêgunehiyê ispat bikin, divê di dosyayê de bên pêşkêşkirin.

Ger di destê te de ti delîl nebin an jî nema bin/tune bibin jî tu dikarî gilî bikî. Li gorî Qanûna Hejmara 6284ê di dema gilîkirinê de tu ne mecbûrî delîlan an jî dokumenan pêşkêş bikî. Lê di dema serlêdanan de, car caran delîl an jî belge tên xwestin û ji ber nebûna delîlan biryara bergiriyê nayê dayîn.

Dema te serî li qereqolê da, karmendê peywendîdar wê îfade û delîlên te yên hene werbigire, lê ji bo berpirsê polîsan an jî cendermeyan bikaribe vê biryarê bide, divê rewşeke lezgîn a aloz hebe û dema dereng bikeve wê rewşeke xeter derkeve holê. Dema rewşeke bi vî rengî hebe, berpirs divê herî dereng piştî biryar hate dayîn bi rojeke karkirinê, vê biryarê pêşkêşî dadwer bike. Ger dadwer di nava 24 saetan de vê biryarê nepejirîne, wê gavê tê wateya ku ev biryar nakeve meriyetê. Kurt û kurmancî rewşeke îstîsna ye ku berpirsiyar biryarên bergiriyê bidin.

Ji ber vê rewşê ye ku baştir e tu bixwe biçî avahiya edliyeyê û giliyê xwe tevî delîlên xwe li ba Navenda Tundkariya li Jinan Dibe û ya Nava Malbatan bike û daxwaza alîkariyê bike. Dibe ev di pêvajoya hiqûqî de bêhtir bi kêrî te bê.

Dadwerê/a Dadgeha Malbatan wê rewşê binirxîne û biryarê bide. Herî zêde dikarin ji bo 6 mehan biryara parastinê bidin. Gur tu bixwazî biryara parastinê bidome, beriya dem bidawî bibe, divê tu dîsa daxwaz bikî.

Ger temenê te li jêr 18an be, Navendên Polîsan ên Zarokan ên bi taybet ji bo zarokan hatine avakirin, wê te bişînin cihên hewce. Ger tu bixwazî piştgiriya yasayî werbigire, tu dikarî bixwe biçî qereqola herî nêzîk. Di rewşeke wiha de piştî temenê te were diyarkirin, wê te bişînin Navenda Zarokan an jî Navenda Şopandina Zarokan. Bêyî ku daxwaza te hebe wê parêzerekî/ê ji te re diyar bikin û li gorî beyanên te wê bi biryara dozger re, tedbîrên parastinê yên pêwîst werin dayîn.

Ger rewşa te ya aboriyê ji bo piştgiriya parêzer nebe, tu dikarî biçî baroya li bajarê xwe û piştgiriyê ji lijne yan jî komîsyonên ji bo mafên jinan an jî mexdûrên tundkariyê kar dikin werbigre. **Di her yek ji van qonaxên dadgehkirina cezayî de (qereqol, dozgerî, dadgeh) tu dikarî daxwaza parêzerekê/î bikî.** Dema şert û merc pêk bên, wê parêzerek ji bo te bê tayînkirin ku wê Wezareta Dadê bi xwe pereyê parêzer bide. Ji vê re tayînkirina parêzerî/ê ya li gorî CMKyê têgotin. Her weha tu dikarî ji saziyên civaka sivîl ên derbarê tundkariyê de kar dikin, piştgiriyê werbigre.

## 6- Encam û Çavkaniyên Piştgiriyê

Me bi van zanyariyan xwest ku em alîkariyê bidin wan mirovan ku tundkarî li wan bûye, ew kes bikaribin mafên xwe yên di dema pêvajoya parastina mafên xwe de bizanibin û alîkariyê bixwazin. Pêvajoya lêgerîna edaletê, ji bo ku mirov xwe di nava ewlehiyê de bibînin û tundkariya lê hatiye kirin bê cezakirin, lê dema mirov dest bi vê pêvajoyê bikin, mafên xwe bizanibin û hay ji wan hebe, wê gavê wê xwe xurtir his bikin û bikaribin li ber xwe bidin. Dema yek ji cûreyên tundkariyê pêk hat, bi taybet jî tundkariya zayendî pêk hat, em hay ji zanyariyan hebin, em mekanîzmayên piştgiriyê bizanibin, wê ev tişt piştgiriyê bidin pêvajoya me ya derûnî û laşî.

Em dixwazin bi van zanyariyan bibîr bixin ku kesên piştî tundkariya zayendî sax mane, ne bi tenê ne, mafên wan tên parastin û pêwîst bike dikarin mekanîzmayên hiqûqî û yên civakî yên cuda bidest bixin. Di dema têkoşîna li dijî tundkariyê de, ger em ji bo mafên xwe gavan biavêjin, em dikarin wê gavê xurt bibin. Ger em bizanibin di vê pêvajoyê de em ne bi tenê ne, di pêvajoyê têkoşînê de ev yek ji gavên herî girîng ên piştgiriyê ye.

Divê em, ew kesên ku piştî tundkariyê sax mane, bizanibin ku ev pêvajo ne sûcê me ye û berpirsê wê, faîlê ku tundkarî kiriye bi xwe ye. Dema em di vê pêvajoyê de gavan bavêjin, mafê me heye em mafên xwe bixwazin, bergiriyên parastinê bixwazin û piştgiriyê bixwazin. Dibe ku pêvajoyên hiqûqî tevlihev û zehmet bin, lê tu dikarî bi alîkariya profesyonelan, parêzer û saziyên civaka sivîl vê pêvajoyê bi rê ve bibe.

Tundkariya zayendî, pirsgirêkeke tenduristiya civakî ye ku divê civak bi hev re li hemberî wê têbikoşe. Em guh didin dengên kesên sax mane, em ji wan bawer dikin û em dubare car dibêjin: Em bi hev re xurt in û tu ne bi tenê yî.

## NIMAREYÊN TELEFONAN YÊN LI TIRKIYEYÊ DI REWŞÊN TUNDKARIYÊ DE TU BIKARIBÎ XWE BI LEZ Û BEZ BIGIHÎNÎ WAN

**ALO 112** Navenda lêgerînê ya lezgîn (Ji bo hemû cûreyên tundkariyê tu dikarî 7 rojan 24 saetan telefon bikî)

**ALO 183** Xeta Piştgiriyê ya Civakî ya Malbat, Jin, Zarok û Kêmendaman (Tu dikarî rû bi rû piştgiriyê bistînî)

**ALO 157** Xeta Alîkarî û Gilîkirinê ya Lezgîn a Mexdûrên Bazirganiya Mirovan

**Navenda Şêwirmendiyê ya Weqfa Stargehan a Jinan Mor Çati**: 0212 292 52 31 (Di nava hefteyê de saet di navbera 10:00-16:30 deqîqeyan de tu dikarî telefon bikî)

**Xeta Alîkariyê ya Lezgîn a Tundkariya di Nava Malan de**: 0212 656 96 96 - 0549 656 96 96

**Xeta Şêwirmendiyê ya Meclîsên Jinan**: 0212 912 42 43 - jimareya **WhatsAppê:** 0505 004 11 98 - 7 rojan 24 saetan vekirî ye.

**Xeta Şêwirmendiyê ya SPOT LGBTI+**: 0850 888 5428 (Cejn û betlaneyên fermî, roja duşem, sêşem û şemiyê ne tê de di navbera saet 12:00 û 18:00ê de vekirî ye.)

**Xeta Alîkariyê ya Lezgîn a Federasyona Komeleyên Jinan a Tirkiyeyê**: 0212 656 96 96 - 0549 656 96 96

**Xeta Piştgiriyê ya Jinan a Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê 7/24**: 444 80 86

**Weqfa KAMERê 7/24**: 0530 664 44 10

**(*) JI SERDOZGERIYA KOMARÎ RE**

**GILÎKAR** **:** Nav-Paşnav (Nimareya Welatîtiyê)
Navnîşan

Gilîkar nav û paşnavê xwe yê çawa ku di karta nasnameyê de hatiye nivîsandin, tevî navnişana xwe divê li beşa "KESÊ/A GILIYÊ WÎ/WÊ HATIYE KIRIN" binivîse

**KESÊ/A GILIYÊ WÊ/WÎ HATIYE KIRIN** **:** Ger faîl diyar be;
Nav-Paşnav (Nimareya Welatîtiyê hebe divê tekez binivîsîne)
Navnîşan (Ger zanyarî hebin divê tekez binivîsîne)
Nimareya Telefonê (Ger zanyarî hebin tekez bê nivîsandin)

Ger faîl ne diyar be;
FAIL NE DIYAR E

Di vê beşa KESÊ/A GILIYÊ WÎ/WÊ HATIYE KIRIN de, ger nasnameya wî/wê ne diyar be, "fail ne diyar e" binivîsîne. Ger nasname diyar be, wê gavê nav paşnav (ger hebe nimareya welatîtiyê), ger hebe navnîşan, ger hebe nimareya telefonê tekez binivîse.

**SÛC** **:** Li vir ew sûcên ku tu difikirî hatine kirin, binivîse.

Mînak;
1- Gefxwarin (TCK Xala 106an)
2- Binpêkirina mafê nepenîtiyê yê jiyana taybet (TCK xala 134an)

**DÎROKA KU SÛC PÊK HATIYE** **:** xx.xx.202x û di dewama wê de ger hebe dîrokên din

**RAVEK**

Di vî beşî de divê bi kurtasî behsa bûyerê bê kirin ku divê tê de navên kesan û dîrok jî hebin. Her weha sûcên ku tu difikirî pêk hatine, bi rengekî kronolojîk rêz bikî. Dirêjiya wê di destê mirovan de ye û dikarin gelek detayan tê de binivîsin.

**SEDEMÊN HIQÛQÎ:** Qanûna Cezayan a Tirkan û Mewzûata têkildar

**DELÎL:** Her cûre delîlên nivîskî, vîdeo, fotograf an jî deng, dîmenên şaşeyan, navnîşanên înternetê, divê li vir bên nivîsîn. Navnîşanên IPyê, yên diyarbûyî û wê bên diyarkirin û delîlên din…

**ENCAM Û DAXWAZ:** Ez pêşkêş û daxwazê ji we dikim ku ji ber van sedemên min li jor rêz kirine û yên paşê wê peyda bibin û ji ber diyar e gûmanbarî sucên lê hatine barkirin pêk anîne, ez dixwazim ew bê cezakirin û çi hewce be bê kirin û ji bo pêvajoya lêpirsînê bişopîne, ji min re parêzerek bê diyarkirin. **…./…./202..**

**Gilîkar**
**Nav-Paşnav**
**(Îmze)**

**TIŞTÊN DIN:**
[Dokûmanên di pêvekê de li vir rêz bikin, mînak kopyayên nasnameyan, delîl, îfadeyên şahidan.]

Divê ev daxwazname bi **Tirkî** were çapkirin, îmzekirin û pêşkêşî yek ji Dozgeriyên Komarî yên li Tirkiyeyê bê kirin. Ji bo ku tu bikaribî naveroka daxwaznameya xwe xurtir bikî û derbarê yaseyan de şêwirmendiyê ji te re bikî, tu dikarî serî li parêzerekî/ê bidî.

***Ger faîl diyar be, cihê ku ew lê dimîne an jî edliyeya ku bûyer lê pêk hatiye binivîse.**

NÎȘE

Association for Struggle against Sexual Violence

cinselsiddetlemucadele cs_mucadele cinselsiddetlemucadeledernegi CinselŞiddetleMücadeleDerneği

www.cinselsiddetlemucadele.org/en - info@cinselsiddetlemucadele.org